RESET
Training and Support

**Pispor li gorî cerebeyan: Kadar li ser mijara standina destûra ajotinê**

Li ser cerebeya Kadar ya xebitîna ji bo destûra ajotinê û bandora xwedîtiya siyareyê ya li ser malbata wî bixwînin.

Bi taybetî li deverên ku derfetên veguhestina girseyî lê kêm in, hebûna siyareyekê parçeyek ji serxwebûna malbatê ye. Lê standina destûra ajotinê li UKê dikare zehmet be û jê re demeke dirêj bivê. UK xwedî yek ji testên teoriyê yên herî zehmet e li cîhanê. Heke înglîzî ne zimanê we yê sereke be, ev hê zehmettir e. Li Înglistan, Wales û Skotlandê testa teoriyê bi înglîzî ye.

Gava em bi Kadar re rûniştin ku behsa cerebeya wî ya li ser ajotina siyareyê ya li UKê biaxivin, wî diyar kir ku ev jê re astengiya herî dijwar bû. Sponsoriya Civaka Bath Bixêrhatina Penaberan Dike Kadar û malbatî wî sala 2021ê li UKê pêşwazî kir. Kadar beriya bigihîje Bathê ajokariya wesayîtên barê giran kiribû û cerebeya wî ya salan ya ajotinê hebû. Di encamê de wî biryar dabû ku ji bo piştgiriya malbata xwe destûra ji bo UKê bistîne û siyareyan biajo. Kadar di dema hevdîtinê de behsa zehmetiyên xebata ji bo testa teoriyê kir û diyar kir ka standina destûra ajotinê jiyana rojane ya malbata wî çawa guhertiye û planên wan yên dahatûyê û hêviyên ji bo kar çawa guhertine.

Ji bo derbarê mijarê de zêdetir bizanî, li jêrê hevdîtina me pê re kirî bixwîne.

**Cerebeya te ya xebitîn û derbaskirina testa teoriyê çawa bû?**

Xebata ji bo testa teoriyê di destpêkê de ji ber zimên zehmet bû. Lê diviya min derbas bikira, lewre mirov li UKê bê destûr nikare siyareyan biajo. Min ev xist serê xwe û gelekî zêde xebitîm û di dawiyê de siûda min hebû ku min testa teoriyê û ya pratîkê derbas kir. Min testa teoriyê di cara heştan de derbas kir lê ya pratîkê di cara pêşiyê de. Ez gelekî kêfxweş im ku min derbas kir.

**Testa pratîkê çawa bû? Te berê ji me re gotibû, ji ber ku te berê ajokariya wesayîtên barên giran kiriye, tecrûbeya te gelek e.**

DI testa pratîkê de ji bo min zehmetî tune bû. Ji ber ku ez ji zû ye ve ajokariyê dikim, ev ji min re gelekî hêsan bû. Mesûlê testa min a ajotinê wekî kesekî zehmet tê naskirin. Lê siûda min hebû ku min dîsa jî derbas kir. Ev ji bo min rojeke xweş bû, lê roja xweştir ew roj bû ku min testa teoriyê derbas kir. Min baş dizanî ez ê testa pratîkê derbas bikim, lewre di vê mijarê de tecrûbeya min heye.

**Çi şîretên te li wan kesan heye ku ji bo testa teoriyê dixebitin?**

Wekî min fêm kirî, ne tiştekî bikêrhatî ye ku pirsên testa teoriyê bi zimanê xwe yê yekemîn bixebitin. Ji bo min ne tiştekî bikêrhatî bû ku pirsên testa teoriyê bi erebî bixebitim. Heke înglîziya wan ne di asteke bilind de be, çêtir e pêşî fêrî înglîzî bibin. Ji bo kesên înglîzî nizanin tişta herî baş ev e bi çavkaniyên li ser malpera DVLA bixebitin ku bi înglîzî ne.

Revîzyoneke wan ya testa teoriyê û beşa pratîkê, testên pratîkê û teoriyê û testa têgihîştina xetereyê heye. Ev ji bo wan kesan gelekî bikêrhatî ye, ku înglîzî wekî zimanê yekemîn naaxivin. Min ev lînk bi kesên din re jî parve kir û wan jî bi xêra van çavkaniyan testa teoriyê derbas kir.

**Gelo bernameyên din yên kompîterê yan bernamokên telefonê hebûn ku ji bo fêrbûna qanûnên ajokariyê bi kêrî te hatin?**

Min ji bo fêrbûna naverokên teoriyê bernameyeke kompîterê kirî ku buhayê wê li dora £80 bû. Min bi wê gelekî pratîk kir. Min her wisa testeke ji înglîzî bo erebî hatî wergerandin jî bi kar anî. Gava min hemû qanûn bi erebî fêm kirin, ez çend caran bi înglîzî lê xebitîm. Ez gelekî xebitîm û di encamê de min derbas kir.

**Karîna ajotinê di entegrasyona nav civaka Bathê de çawa bi kêrî te hat?**

Karîna ajotinê bêguman fêde da entegrasyona me û cîwarbûna me ya nav civakê û gihîştina xizmetên civakî yên ji me re pêwist. Siyare ji bo entegrasyonê gelekî bikêrhatî bû, lewre ez dikarim bi zarokên xwe re zêdetir tiştan bikim. Hebûna siyareyê bi taybetî ji bo zarokan baş bû. Ew gelekî kêfxweş in û ji ber hebûna siyareyê wan ji havînê kêfeke zêdetir stand. Min gelek caran ew birin parkê û havînê çend caran birin peravê û gelekî kêfa wan hat. Ew gelekî kêfxweş in. Gava em bixwazin herin ciyekî ku wesayîtên girseyî naçinê, siyare ji bo me hêsankarî ye. Ez dikarim niha zarokên xwe bibim ba zarokên din yên li herêmê.

Siyare ji bo randevuyên tenduristiyê yên zarokên min jî gelekî giring bû. Bi keça min re tansiyona çavan heye û em wê gelekî dibin nexweşxaneya li Bristolê. Em wê bi awayekî birêkûpêk dibin randevuyên bijîşkî û em carê bi bijîşkî re tiştên cuda dişopînin.

Siyareyê di aboriya me de bi awayekî din cudahiyeke pozîtîf çêkir. Wekî mînak, heke ez bi zarokên xwe re biçûma navenda bajêr, bi wesayîtên girseyê heqê rê ji bo tamamê malbatê gelek bû. Em bi taksiyekê yan jî bi otobusekê diçûn, û ev buha bû. Heqê çûn û hatineke navenda bajêr bi zarokan re heqê benzîna min a du hefteyan bû.

**Ajotina siyareyê bandor li budçeya te kir?**

Ji hin aliyan ve ji hêla aborî ve ji min re bû alîkar lê ji aliyê din ve mesrefên nû derketin. Heqê sîgorteya siyareyê dikare buha be. Lê ji ber ku ez di demeke krîza aborî de diajom; bi awayê giştî rewşa min a aborî çêtir nebû.

Em ji ber bilindbûna lêçûnên jiyanî û ji ber her tişt buha dibe zehmetiyan dikişînin. Lê dîsa jî, siyareyê bi min re guhertineke mezin çêkir lewre ez dikarim xwe bigihînim gelek firoşgehan. Wekî mînak, beriya ez testa xwe derbas bikim, gava ez ji bo kirîna goştê helal yan jî tiştekî din biçûma Bristolê, min ji bo çûn û hatinê li dora £80 dida taksiyê, lewre em malbateke mezin in. Ev mesrefeke zêde ye. Loma di vê rewşê de hebûna siyareyê cudahiyeke mezin çêdike. Niha ez ji Bathê heta Bristolê li dora £7 didim benzînê. Ev her wisa çûna randevuyên bi zarokan re jî hêsantir dike. Taksî gelekî buha ne, loma hebûna siyareyê derfeta teserufa pereyan jî dide. Gava ez bixwazim ez dikarim ji bo çûna dikanan herim Bristolê. Firoşgehên Barthê buha ne.

**Planên te yên ji bo dahatûyê çi ne?**

Niha ji bo peydakirina karekî çi ji destê min tê ez dikim. Min hê nû serlêdana ji bo ajokariya otobusê kir, lewre min testa teoriyê û ya pratîkê ya ajokariyê derbas kir. Ez dixwazim bibim ajokarê otobusan ku dikaribim alîkariya malbata xwe bikim.

*Gelekî spas Kadar!*